

Dabas

KEW Û KURD

Tiştêk hêsanî nayê lidarxistin û avakirin. Her kirin, çalekî û bûyer, karekî têr ked û xwehdan dixwaze. Biçûk mezin... Bê wejartin her kar di nava xwe de xwedî teybetiyek cuda ye û xwedî pêkanînek hempa ye... Xweza di nava xwe de bi wê hûnandin û ristina mezin ku bilî destdirêjîyên mirovan, destûr û zagonên wê nayên guhertin, her tişt têkilî hevûdin e û her tişt di nava guhertin û nûjeniyek safî, geş û têr ronahî ye... Mirovaniyê pêwistiya axaftinê ji bo têkiliyên nabera xwe de, pêwistiya pîtan û nivîsandinê bo safbûn, geşbûn û ronahiya pêşerojan dît. Herwiha wilo jî berdewam dike.

Di nava refên lawiran de û di nava komên merivan de her bûyer û rûdanên dibin eger ne li gora zagonên xwezayê bin pirr zû ferq dibin. Eger ev yek neyê qebûl kirin û di hember de bê kar kirin hundabûna dozê muheqqeq dibe. Ango, li hember şertên jiyane, zagona xwezayê û rastiya hebûn û nebûnê derketin dijwar e. Mahkûmê hundabûnê ye. Ev rastî ji bo her tiştî weha ye. Ji bo me Kurdan jî... Berê civaka me, şertên wê, pêwistiyan hebûna me di pêşerojê de çibin divê em wan di jiyana xwe de qebûl bikin. Eger em bîr û bawerîya xwe, eger em xwestina xwe, eger em hêza xwe di ser her tiştê din re bibînin û xwe li ser tişt û hêzan ferz bikin emê zû biterpilin. Ketina me jî ewê dijwar be. Ji sedema ku gelê Kurd ji hebûna xwe û vir de di nav xwezayê çiyayî, rengîn û xweş de jiya ye gelek çîrok û meseleyên hîmdar di nava edebiyata devkî ya Kurdan de hene. Weke mînakê em dikarin mesela şibhandina Kurd û kewan bidin. Em Kurd, tim Kew tewanbar dikin. Ew kewê ku di deşt, mesîl, newal û çiyana de her dem bi ref jiyana xwe berdewam dike bi destên mirovan dikevina nava xiyaneta nîfşê xwe de. Lê kes tê nagihije ku ew kewê dîl bûyî ku ji teref mirovan li ser ferşik û hejikan tê danîn, dilojarêya dîlîtî û banga hawarê ya azadiyê dike. Ew kewê din jî têne hewara wî.

Ku em dêhne xwe didine tola nêçîrvaniyê, nêçîra kewan ya herî navdar li cem xelkê Kurd heye. Ev tê wê manê ku kew jî ji teref Kurdan fêrî xiyanetê bûye. Vêce pîrsa ku meriv ji xwe bike ev e. Gelo sedem çiqasî dijwar e ku Kurd giha ye vê derecê ku hem di nav xwe de dikare xiyanetê li hember xwîna xwe bike û hem jî dikare lawîrekî mîna kew fêhrî xiyanetê bike. Ew çawa dibe ku çanda me ya kevn û zengîn Beko Awanê xwîzik û wî tovê bê zîret di nava xelkê Kurd de jîndar dike. Çi hêz û terbiye pêwîst e ku ev tişt ji nav me rabe?

Medenî FERHO

LÎ SER ÇALEKIYÊN ENSTITUYÊ ÇEND GOTIN

Enstituya Kurdî ya Bruksel weke hemû saziyên çandî û hunerî hewldanan dike ku gavên hêja bi ber armanc û hêviyên xwe de pêk bîne. Hemû astengên ku peyda dibin derbas bike û bi hêz û viyanek tevayî ji paş bi hêle û pûç bike.

Bêgoman ji bo bi destxistina vê daxwaziye dijwariyên ne hêsa carcaran riya xwe dibînin, hem di nava kar û xebatên serekî de û hem di şax û baxên jê tene der de...

Gava em wê bi nasînin di pêvejoka wateyên kar û xebatên bingehîn yên saziyên çand û huneran de, em dikarin bînin ziman ku îro her çar komisiyonên birêvebirina proje û milbarîyan di derheqa berdewamiya berpirsiyariya xwe de radiweste.

Ev berpirsiyariya ku bûbû sedemek pêwîst ji guherînên giştî re (bi taybetî di kongreya dawî ya 1996 an de) bi armanca jiyankirina vê saziyê ku rola xwe ya çandî xurt û ferehtirîn bikê de nav komelgeh û civaka hemû rewşenbîr û ronekbîrên Kurdistanê de, ev ji aliyekî ve, herwiha berpirsiyariya çanda neteweyî girîngiya pêkanîna plannameyek salane anî meydane.

Bi awayê ku hem kêmasî û qelsiyên li ser, hem jî serkevtinên divêyî di rojevêk salane ber bi fereh de berev bibin. Ev ji aliyê din ve di çarçeweya van nuhbûn û pêwsitiyên divêyî Enstîtu di 27.08.1996 civînek vekirî bi gel re lidarxist. Ji bo ku qonax û rewşa xwe bîne ber çavan, herweha ji guftûgoyên çalakgîr bi endam û berendam re kir.

Komîta birêvebirina enstituyê (Derwêş Ferho, Şêrgo, Kerîm Baqîstanî, Mustafa Aldur, Mihdî Aldur û Medenî Ferho ji aliyê komisîyona çand û wêje, Muzîk û Huner û komisîyona mafê mirovan û têkiliya bi civakê re) beşdarî civînê bûn. Bi civîndaran re li ser pîrxalan hat rawestandin.

1/ Pêşvexistina têkilî û girêdanên endaman bi enstituyê re...

2/ Bilindkirina moral û giyana alîgirî...

3/ Pîrsgirêka hindêk teknîkiyên kar û xebatên, bi teybetî di mijara serwîs sosyal (alîkariya civakî) de...

4/ Rewş û dijwariyên xala diravî û materyalî...

5/ Nêrîn û pêşniyazên beşdaran...

Civîn bi encamên xweyî pozîtîv bi dawî hat û hemû pîrs di minaqeşeyek germ de çareser bûn. Bêgoman ev çareserî di kirin û çalekiyên pêşerojan de, hinde bi hêz û zîrekiya birêvebiran û hindêk bi alîkarî û piştgiriya endam û berendamên wê pêk be. Mîna her tiştî, têkilî û destdana hevreyî dibe çareseriya pîrsgirêkan û qonaxa serkevtî ya pêşerojan...

Ku qonaxa îroyîn ku gelê Kurd tê de daxwaz dike ji her kesê Kurd, biçûk mezin da gaveke hunandin, ristîn û damezrandina civakî ya komelayetî û neteweyî di derbarê sazî û dezgehî de bo pêşerojên azad û serbest.

Ev jî dibe hewldan û hêza sazî û dezgehên neteweyî. Kes di derheqa hûnandin û ristina netewe bi dudilî û dîlkuliya berjewendî nikarê nêzîkî sazî û dezgehê bibê. Lê sazî û dezgeh jî pêwsîte bersiva daxwaz û hewceyîyan bide, da hêvî û armanc bi hevûdin re bêtin çareser kirin.

Kerîm BAQÎSTANÎ

BERPIRSARIYA REWŞENBÎRAN

Günay ASLAN

Gelê Kurd ku ber bi neteweyî û dewletî de gavên pratîkî avêtine û gihaye qonaxek mezin û dîrok ketiye nava gengeşiyek nûjen de, berpirsiyariya rewşenbîrên Kurd ya dîrokî di hêla girîngiya gavavêtinan de xwe diyar dike.

Ev qonaxa han dide xuya kirin ku berpirsiyariya rewşenbîrên Kurd tucaran û tu deman weke îro darîçav nebûye û ne ketiye wateyek bingehîn ya jiyane de.

Ji ber ku gavên dewletî û neteweyî hatine avêtin, dive ku bi stewihîn û di hêla sazîbûn û avahiyên stûnî yê pêşerojê jiyana berdewam de bêne saxlem kirin. Helbet ev karûbar dikeve ser milên rewşenbîran de.

Gelê me bedelên pîrr mezin dane. Şerê ku tevlihevî û diwariya wê her roja ku tê bêhtirîn xuya dike û bandorê li nehêzbûna sazî û dezgehên ku bi bedelên mezin hatina damezrandin qels û çilmisî dike, xera dike û bê bandor dike. Rastî ev e ku pîrraniya sazî û dezgehên me bê hêz in, bê bandor in...

Di avahiya sazîbûnê de ev bêhêzî, valahiyên di nava komên xelkê de danagire. Helbet ev rewş bo ragihandin û gihandina pêşerojan astengên mezin derdixe hemberî me. Tehlokeyek mezin îro darî çavan e. Ji bo gelê Kurd jî ev rewş rîskek mezin e. Rewşenbîrên Kurd, pêwîste ku li sazî û dezgehên ji teref şoreşa Kurdî ve bi bedelên mezin derketine holê xwedî derbikevin. Bi rastî û duristî nêzîk bibin û çî ji destên wan bê bikin.

Tiştê ku divim bêjim, karbendiya ku îro li ser milên rewşenbîran bûye, tevlihbûna avakirina sazî û dezgehî ye. Pêwîste ku rewşenbîrên Kurd, zanyarî û têgihîştina xwe teva zerkî nava vê hunandin û ristina sazî û dezgehan bikin, dewlemendî û bihêziya wan pêk bînin.

Dive em ji bîr nekin ku jenarasyona çend rewşenbîran xwest ku alîkarî û piştgiriyê bikin, mixabin dijmin rê neda, ferece ji wan re nehîşt. Belkî ev hunandin û ristina sazî û dezgehî ne anîne bîra xwe jî. Şansek û ferezendeyek wan î wilo jî dernekete holê û çûne ser dilovaniya xwe.

Car din mixabin ew zanistî û têgihîştina wan bi wan re kete goristana bihiştî de.

Gelo îro wilo ye? Îro, gelê Kurd bi kedi xwehdan û fedekariya xwe giha vê qonaxa bilind. Helbet ew gelê ku ev rewş derxista meydanê, bo parastina vê qonaxê wê lingê xwe li erdê bide û meyldar raweste. Helbet hinek caran bûyerên tewanbarî derdikevin holê. Lê, ev teva nabe sedema ku rewşenbîrên Kurd ji nava hunandin û sazî bûna gelê xwe dûr bikevin.

Dive ku neyê ji bîr kirin meydan û tîkiliya rewşenbîran bi gel re dibe qedirnasî û nixandîne jî. Ev parvekirina balhîlgirî ya rewşenbîr û komên xelkê wê her hêlan bi hêz bike. Ji vê rewşê jî helbet welatê me û pêşerojê me fêdê distînin. Belê, hewceyiya tîkoşînê bi sazî dezgehiya rûnştî û bi hêz heye. Ew gelên ku ev rewş berhimbêz ne kirine li pêşeroj û demjiyanên xwe yê berdewam ne êminin. Berxwedanek destanî, şerekî neqam û tîr qirêj û bi bedelên pîrr giran û tîr xwîn ku gihaye qonaxê ku sazî û dezgehên neteweyî tîde tîne avakirin mîna rêbûwariya gihîştina welatekî azad e. Ez banga xwe dubarî dikim û dibêjim ji bo hêzbûna sazî û dezgehên me, rewşenbîr dest hilînin û bar hilgirin.

PERWERDE KÎRÎN
KARÛBARÊ SALAN Û NÎFŞAN E

Mistefa QESRÎ

Di demeke kin de gelê Kurd jî sedî pêncih penaber bû. Ev penaberî ne tîn di rojhilata navîn de ma, dirêjî Ewropa û cihê din bû. Bi vê koçberiyê, ji aliyê pîrr waran de şiyar bû û hêdî hêdî pîrsgirêka xwe nas kir. Li vê pîrsgirêkê xwedî derket. Ji van pîrsgirêkan ya herî girîng ew e ku li çanda xwe xwedî derket û di nava vê xwedî derketinê de perwerde kirina zimanê xwe pêk anî.

Zimanê Kurdî her çiqasî dewlemend be jî, bi destên dijminên dagirker ku hatiya wêran kirin û talan kirin, ber bi asimîlasyonê xurt de diçû. Bi sed salane ku hember zimanê Kurdî gavên qedexekirina ziman hatine avêtin û bendên qalîn û bilind li ber pêşveçûna ziman hatine avakirin. Lê îro bi ferezenda pîrr bedelî ku bi dest xwe xistiye li çanda xwe xwedî derdikeve û pêre jî xwendin, nivîsandin û axaftina Kurdî xistiye rojevê de. Sazî û dezgehên neteweyî ku hatine avakirin jî destên xwe dirêjî alav û halet û firaxên (materyalên) dibistanan (mîna pirtûkan) kirin.

Li hinek bajarên Elmanya û Holanda dibistanên fermî hatin vekirin û dest bi dersdana zarokan kirin. Lê pîrsgirêkên ku derketin hemberî vê rewşê: Yek, nebûna mamsota... Du, kêmasiya pirtûkan... Dema mamostan nebin perwerde kirin çênabe... Dema perwerdeyî çê nebe zarok jî bo pêşerojan amade nabin... Di perwerdekirina zarokan de helbet, malbat, dibistan û demador girêdayî hevûdin in... Îcar jî van her sê xalan jî yek bi tenê amade tune ye. Zarokên Kurdan di welatê xwe de fêrî Tirkî, Farisî, Erebi dibûn. Dema koçberî Ewropa bûn pêwîst e ku herin dibistanên wan. Helbet her sê zimanê ku berî niha me hejmart tenê baş (grametîkî) dizanin. Bingeh ev e û li ser vê bingehê wê fêrî zimanê Ewropîyan bibin. Bê goman dîrketine ji zimanê Kurdî di bingeha xwe de bû çare... Dê û bav jî ne di wê hewldanê de ne ku zarokên wan hêdî hêdî tîne helandin, yanî asimîle kirin. Yanî li welat jî, li Ewropa jî zarokên me ber bi asimîlasyonê diçin û dûrî ziman û çanda xwe dibin.

Gelo, li Ewropa, em dikarin îro çî bikin û pêşbirkên vê tîkçûnê ava bikin?

Yek: Kêlîkê berî kêlîkê ji teref sazî û dezgehên neteweyî ve mamoste bêne perwerde kirin. Du: Sazî û dezgehên neteweyî yê Kurd tîkiliyan bi hevûdin re datînin û karê perwerde kirinê xurt û bi hêz bikin. Sê: Pirtûkên Kurdî yê zarokan, li gorî her temenî li gorî teknolojiyê biweşînin. Ev pirtûk ji teref nivîskarên Kurd ku di hêla pedagojîk de têgihîştî ne bêne amade kirin û ji teref sazî û dezgehên neteweyî bêne weşandin. Çar: Pirtûkên hatî weşandin, bi zarokan re dê û bavên zarokan jî bixwînin û bi çalekiyek hempa komên xelkê yê Kurd ber bi xwendina Kurdî bêne ajotin. Pênc: Kovar û rojnameyên Kurdî pîrr bibin û her û her li ser xwendin û nivîsandina Kurdî rawestin, bi çî awayê hebe xwe bigihînin malên Kurdan...

Weke her kesî bi reklam û ragihandinên modern tîkevin nava gelê Kurd de. Êdî, serlêdana bûyer û çalekiyên rojane nemînine bi zimanê biyanî. Bêgoman perwerde kirin karûbarê salan û nîfşan e. Lê ne bê wateyên ku nayên destan e.

ÇAND Û BIYOLOJÎ

Amadekar: Medenî FERHO

Biyolojî: Zanistiya canliberan teva, yanî canliberên bi fosîl ku bi demjiyana giştî û fîzyonomiya wan î kîmyewî (hunandin û ristina wan î kîmyewî) mijul dibe û lêkolînan dikê ye. **Biyolojî**, bi dabaş û mijara xwe ya kûr û girîng, ji destpêkê heya îro, ew canliberên ku lêkolîn kirine û ji bo têgihîştina vê hûnandin û ritina balkêş, di nêzîkbûna ser mijaran weke ezayên laş teva, ra, tara, tarişk, rîşal, dil, hinav, hestî, xwîn, şanik û girêdanên şanikan, gewrmorîk û sormorîk û parçeyên din yê giştî û bi tenê xwe pêwistî wejartina beş û mijaran dîtîye û lêkolîn û lêgerînên xwe bi dorferêhî wilo domandiye.

Şaxên biyolojî: Di wejartina canliberan de, şaxên biyolojî yên herî kevin û balkêş **zoolojî** ku bi lawiran mijûl dibe û **botanîke** ku bi nîşên geyê mijul dibê ne. Tê bawer kirin ku li ser rûwê cîhanê nêzîkî 4,5 milyon nîşê lawir û geyê dijîn. Ji van nîşan encex 1 milyon ketiye ber himbêza şaxê zanistiya biyolojî de. Tê ragihandin ku nîşên dikevine ber himbêza Paleontolojî de ku ji jiyane rabûne hejmara wan nêzîkî 15/16 milyarî ne. helbet nîşên mîkroskobîk ne di nava her du hejmaran de ne. Hejmarek hewqasî zêde pêwistiya wejartina vî mijari di nava xwe de û şaxan derdixe hemberî mirovaniyê. Minaka zoolojî û botanîk ku bi giştî nîşê lawir û geya ji hev cuda kiriye darî çavan e. Bêgoman ev mijar jî di nava xwe de tene wejartin. **Ornitolojî:** Şaxê lêkolîna çûkan. **Îhtiyolojî:** Şaxê lêkolîna masiyan. **Herpetolojî:** Şaxê lêkolîna amfîbyuman (zikerdî). **Entomolojî:** Şaxê lêkolîna kêzikan. **Mîkolojî:** Şaxê lêkolîna kumikan, yanî kuvaran. **Algelojî:** Şaxê zanistiya Algeyî.

Bi van teva re li ser nîşê mirovan jî lêkolîn û lêgerîn ku çêbûn, veketin û pêşketin teva di nav de ye, yanî mirov bi hunandina **biyolojîk** û guhertinî de fam kiriye, pêre jî tevger û guhertinên civakî û komaleyatî û çandî di hêla fîzîkî ya **antropolojîk** û **zoolojîk** û **biyolojîk** de gihandiye qonaxa îro heye. Di nivê duyemîn ya sedsala 17 an de ku mîkroskop pêş ket, ezayên mîkroskobîk jî, (di sedsala 19 an de) ketin nava şaxên vê zanistiyê de û di lêkolîn û lêgerînên biyolojîk de gavên mezin û girîng hatin avêtin. Hejmarek zêde û pirr tevlihev bi lêgerîn û lêkolînan nû ku her roja bûrî bêhtirîn tiştên cuda derdikevin hemberê mirovên zanist, pêwistiya wejartina mijar û babet û şaxan heye. Ji lêgerîn û lêkolînan ku ji Yewnaniya berê û vir de di encamek bê rawestandin berdeyam e di hêla botanîk û zoolojîk de bi destavêtina taksonomî zanistî li ser bingehek saxlem hate rûnandin.

Îro, bi xêra taksonomî ne bes hûnandin û ristina laşê canliberan û wekheviya wan û cuda bûna wan bi tenê tê zanîn û darî çavan. Şanik û molekul teva bi her hêla hunandin û ristina biyolojî û karbendiya ezayên tê zanîn û derdikevê ber çavan. Bi vê gavê jî şaxekî nû derketiye meydana ku navê wê **morfolojî** ye û ev şaxê zanistî li wekhevî û cudabûna laşê canliberan û kerbendiya ezayên laşê canliberan mijul dibe. Pêşî hunandina laşê canliberan yê darî çavan û beşên wê hûnandina balkêş li gorî mezin bûn û ristin û girêdana wan, di encama tîkiliyên bi ezayên cîran re dihate lêkolîn kirin ku navê wê **anatomî ye**. Her wiha fêda mîkroskobê jî ew e ku di hêla nîş û ezayên biçûk yê mîkroskobîk de, piştî pêşketine mîkroskobê diyar bû û şaxekî nûjen yê lêkolîn û lêkolîna biyolojîk pêwîst kir. Navê vî şaxê zanistî di hêla tevger û hunandina hûrik kete nava şaxê **morfolojî** de. **Embriyolojî** jî kete nava vî şaxê zanistî yê morfolojî. Embriyolojî li ser canliberên pirrşanîkî diraweste û hewl dide lawîrên nîşê **zîgot** ku veketina xwe bi yek hêkê dîkin.

Ev şax demjiyana gohn xwarin û ducanî û veketinê teva dide ber himbêza xwe. Ji destpêka vî şaxê zanistî ku pêşî li Yewnanîstanê dest pê kiriye, heya îro di pirr qonaxên balkêş re derbas bûye û gihaye qonaxa îroyîn ku pêşketî ye û bûye xwedî wateyên çareser di pirr hêlan de. Û li ser hunandin û ristina laşê canliberan ya fîzyolojîk ku girîngiya xwe diparêza û her roja diçe jî balkêş û pêwsit dibe. Weke her karûbarî û pêkanîna mirovên zanist, ev şaxê zanist î pirr girîng girêdayî teknolojî û makîneyên pêşketî ye. Alav û firaxên laboratuwaran ê pêşketî di qonaxa îroyîn de, ji bo mirovên zanist yê vî karî di xasletên pêkanîna tenduristî û di pêşerojan de bikêranîna nîşê wejartî yê genetîkî, yanî bereyî hêviyên mezin dide.

Bêgoman tîkiliya şaxên zanistî bi hevûdin re heye. Têkilê Kîmya û fîzîk û biyolojî, **biyofîzîk** û **biyokîmya** derketiye meydana. Ji tîkiliya biyolojî û îstatîstîkan **biyometrî** derketiye meydana. Di encamê de tîkiliya biyolojî bi ya gerdunê re çêdibe û şaxekî nû ku navê **biyolojiya gerdunê** derdikeve meydana. Her wiha zanistiya deryayî bi tîkiliya biyolojî re, **biyolojiya deryayî** derketiye meydana. Her wiha dîroka van şaxên zanistî ji dest pêkê heya qonaxa îro, ku bingeha van şaxên zansitî bi pêgihekê lingê xwe diberdê navenda Kurdistanê, navbera her du çeman, yanî Dicle û Firat, Berî Îsa şaxan diberde salên 2500 î û di qonaxên pirr tevlihev û balkêş re derbas bûne. Di hejmarên xwe yê bê de jî emê li ser van bûyer û çalakiyên dîrokî yê zanistî rawestin. Me hel daye ku di her hejmarê de pêvejokek çar rûpelî û mijarên cûrbecûr ku teva çandî, wêje, muzîk, kêkolîn, zanistî yan jî hunerî rawestin û bighînin we xwendevanan.

Not: Ev agahdarî ji Ansîklopediya Ana Brîtanîca û çend prîtûkên din yê li ser biyolojî, hatine stendin

SKELET= Gotineke Yewnanî ye, di zimanê Yewnanî yê kevin de di maneya hişkî de tê bikaranîn. Ji sêdema ku hestî jî hişkin bû ye navê vê avaniya hişk ku stûna laşê mirov û saxlemiya laşê mirov. Di zimanê Kurdî de bo bersiva skelet 3 gotin hatine bikaranîn. Ne mîna di zimanê Yewnanî bi hişkî û bêcanî... Ji ber ku hestî teva bi can in û kar dikin, li gorî têgihîştin û azmûn kirinên bi sedsalan nav lê kirine... Hê jî ev gotin di nava gel de têne bikaranîn. **QERQÛDE**... Yan jî **QERADE**... Ev peyv di maneya hişkbûnê de, di maneya bê goştî, misrî, çilmisî ku hew bikêrî kar tê, lê dilve û di leptekê bêxêr de ye tê bi karandin. **WESELE**... Hunandina hestiyar teva. Ev peyv carcaran ji bo parçeyek ji skelet jî tê bikaranîn. **Û HESTÎPEYKER**, di nava zaravê Soranî de tê bikaranîn.

Skelet, ji bo parastina laşê canliberan û saxlemiya stûna laşê canliberan e!.. Hinavan û ezayê laşê mirov yê hundir û ji hêza kêşîerd û derbeyên derve diparêze. Bilî vê lept û livandina laş jî di encameke ahengî de tîne cî. Karbendiya qerqûde, yan jî qerade, yanî skelet di 3 encaman de xwe diyar dike. Parastin... Palikî... Lept û livandin... Hinek ji lawiran, pîrraniya lawirên avî bê wesele ne. Yanî bê skelet in. Lewra jî lept û livandina canliberên bi skelet leztir û xurtir ji yê bê skelet in. Skeletên hinek ji nîfşên lawiran jî li derveyî laşê wan e. Mîna Kîso, Req û Kêfjalê... Ev nîfşê lawiran beji û avî ne. Rengê skeletê derveyî laş ji teref xweza, bo parastina lawiran hatiye çê kirin. Navê vî rengê hestîpeykeran, di nava komên xelkê de **qaqilk** e. Ev qaqilk ji maddeyek pîrr saxlem û pîrr sivik, ku navê wê **kufîn** e, hatiye çê kirin. Rengê çêbûna skeletên ji parçeyên ku derî laş e, bo derbeyên ji derve ve tînan awantajek mezin e. Skeletên hundir, azadiya lept û livandinan, elastîkiyatiyê û lezbûnê dide. Weselê laşê mirov bi xasletek ku mirov çawa bixwaze wilo livandinê bike hatiye avakirin. Her hestî û grubê hestiyar karekî teybet dike. Di skeletê mirovekî de bi pîrranî ji hindikayî ve 206 heb hestî hene. Ev hejmar carcaran tê guhertin. **QOQ**, yan jî **CİMCİM**= Rekiha parastina rûdên û serê canliberan e. Di hestiyên qoq de, bilî hestiyên argûşkê, teva bê lept û livandin in. Bo parastina mêjî, ji zarokî bi hevûdin re girêdayî mezin dibin. Qoq, li ser stûna movikên piştê rûniştiye. Movikên piştê jî, ji hestiyên grover, yanî bi navê zanistî **vertebre** çêdibin. Ev hestiyên saxlem mêjiyê nava stûna movikan diparêze. Mîna hestiyê din ev movik jî, bi rîşalk, tarîşk û rata bi hevûdin ve girêdayî ne. Pîrraniya qerqûde mirovan ji 12 parsûwan in. Lê, ji her 20 kesî yek ji mirovan bi 12 parsûwan e. Parsû, hinavan diparêzin û alîkariya bêhndan û stendinê, yanî henase dikin. Ev hinavên hundir ku ji teref parsûwan tîne parastin: **Kezeba Sor, Kezeba Spî, Dil, Rovî, Fişik, Zirav**... Ûr û hinek ji roviyan jî bi wê rekiha parsûwan ve girêdayî ne. Di xilaseka parsûwan de **pol** heye, yanî **peltûs**... Pol, hinavên di valayîya mirovan de di parêze û dibe palika herî mezin. Qoq, movikên piştê û rekiha parsûwan û pol, ji ber ku li ser yek eksenî ne, teva bi navê **weseleyên eksenî** tîne naskirin. Hestiyên jêr û jor yê çengan dirêj in. Bi kêrî livandin û lept û lez û bi hêz, mîna mişar û misasê kar dikin. **Dest**, bikêrî rahiştin û girtinê tîne. Bi hestiyên kin û qut, bi kêrî karên delal û hunerî tîne. Hestiyên **rohnan**, yan jî **pîjaqan**, hestiyên herî giran û dirêj in. Hestiyên di rohnan de bo lept û livandinê fereh û dirêj in. Hestiyên **lingan** bo mana şîpê ne. Û bikêrî karê revê, meşê û çûnê tîne. Hestiyê binê ling mîna kevan e... Dibe palika giraniya laş. Hestiyên çeng û rohnan, **weseleyên kêlekî** ne... Ev avaniya sexlem ji hestiyar, helbet bixweser nikare lept û livandinê bike. Lept û livandin bi alîkariya **tara**, yan jî **rîşalkan** ku bi hevûdin ve girêdayî ne didin û distînin. Ji ber ku hestî

lept û livandina wan, ji deverên ku hestî bi hevûdin ve girêdayî pêk tê. Lê, lept û livandina **gevdik**, yanî **bask**, yanî **xirxal** dest jî bi rengê şemî çê dibe. Girêdanên milan, mîna girêdanên rohna ne. Azadiya hestiyar û livandin, ji teref girêdanê çê dibin. Yanî bi tara û rîşalkan çê dibin. Ji bo livandin û lept û hosteyî û hunerî, bi lept û livandina pîrr hestiyar çê dibe. Mîna mirovên ku sporê dikin... Hingî hestî, tara û rîşalk teva bi hevûdin re rîtmîk û ahengî lept û livandinê dikin. Û giraniya hestiyar jî xweş diragirin. Hestî ji derve ve hişk e û hundirwê wî vala ye. Di wê valayîya hestî de mêjî heye **Mêjî** nerm û tîr tewaş, yanî dohn e... **Mêjiyê** zer di nava hestiyar de bo depo kirina tewaş, yanî dohn e... **Mêjiyê** sor jî ku di hestiyar de heye pîrranî di gupika serî û stikura hestiyar de ye. Û karbendiya hucreyan, yanî şanikan dike. Hestiyê ku ji hundir ve hatî paqijkirin, yanî **mêjiyê** wî hatibe derxistin dişibihe tûpekî vala. Gupika serê hestî û stikura wî pîrr nazik û nazedar e û qulqulkên moxilkî ne. Zirav xuya bikin jî pîrr saxlem in. Gelo, xweza çima hundirwê hestî vala hiştiye? Gelo teva dagirtî ba ne, bêhtirîn saxlem ne dibûn? Lê, mirovên di vî warî de zanist bi azmûn kirinan ev tişt fam kirine, ku hêza her tiştî ji hêza dora wê tê. Ji ber vê çendê jî hestî hêza xwe ne ji hundirwê xwe, ji dora xwe distîne. Hêza gupika serî û stukurê jî saxlem û hêzê dide hestî. Saxlem û bi hêziya hestiyar bilî rengê wan ji hunandin û çêbûna wan ya kîmyewî jî tê. Hestî, ji 3/1 maddeya **moleynelyaf**, ê din jî **kalsiyum** û **fosfor** e. Hişkbûna hestî ji dewlemendiya fosfor û kalsiyum tê, lê ev her du madde jî bi hêsanî tîne şikandin. Bilî avê du elementên din jî di çêbûn û hunandina hestî de hene. Ev element bi xwe ser rizî, kevnare û bê hêz in. Lê ku tevî hevûdin bûn pîrr saxlem û bihêz dibin. Hinek ji hestiyên mirovan heya bi tonek giranî jî dihilgirin. Mezinbûna hestiyar jî, di gupika serê wan de ye û demeke pîrr girîng tê hesabê... Navê vî qatê hestî, **qatê mezinbûnê** ye. Qatê mezinbûnê jî **karkarîk**, yan jî **kerikek** grover çê bûye. Mezinbûna hestiyar ji perçebûna şanikên vê karkarîkê çê dibe. Yanî bi atina şanikên nû re, karkarîk mîna stûna duvrirêj dibe û mezinbûna hestî pêk tê. Bi berdewama zêdebûna şanikên ciwan, dora şanikên kevin bi kilsê, yanî kalsiyum tê pêçan, karkarîk jî hişk dibe. Di vê demê de şanik hûr hûr dibin û dikevîne valahiyên nava hestî de. Berdewama mezinbûna hestî, van valahiyan fereh dike. Hingî jî, rayên xwîne bi hêz dibin. Ew şanikên ku hestî çêdikin bi rayên xwîne re mezin û bi hêz dibin. Karkarîka dora wê bi kilsê tê seyandin û dibine hestî. Şanikên di dirêjiya hestî de grover in. Tarîşk û tara yê pîrr ziravik ku xwîn di wan de heye di nava hunandina hestî de hene. Di nava her sîstema girêdana hestî de cokik heye. Di nava vê hunandinê de bi hezaran şanik hene û ev şanir heya dawîya jiyana can li beran jî bi can in û dijîn.

ÇERM= Di laşê mirovan de ji yek parçeyî pêk hatiye û ezayê herî fereh û mezin e. Saxlem e, nerm e, şahîk e, qermişonkî ye... Mirovan her û her ji b delalî û xweşikbûnê guh daye çermê xwe û boyax kiriye, dest avêtiya hêla tîbbî û dermanan bo tenduristî û vê delalî û xweşikbûnê. Ji kîjan çand û heremê be, mirovan taybetîyek xas ji bo çermê xwe nîşan daye. Lê, dive ku em xweş dizanibin ku çerm, j bo mirovan, ramana dilnermî, têhnîk û hissîyatî ye jî. Ji bo mirovan, giringiya çerm mezin e.

Çerm di nava hunandinek pirr seyr de ye.

Çerm, laş ji derbeyên derve diparêze. Ji hêlekê ve germahiya laş pêk tîne. Ji hêla din ve hînkayiya laş pêk tîne. Hember nexweşiyên jî parezera herî pêş e. Di şewatê de ku çerm li ser laş ne pêçayî be, agir wê goştê laşê mirov zu bihelîne. Lê, çerm bi hêziya xwe goşt diparêze. Xasletek erm ya din jî ew e ku zûtir ji goşt xwe nûjen dike. Bilî vê, goştê şewitî dibe qonaxa nexweşiyên, lê çerm vê parastinê jî bikar tîne. Helbet bi têhnîk û hingivandinê, ku çerm ragihandinê dide mirov, mirov xwe amadeyî kar û bar dike. Çerm ji qatên curbucur hatiye hûnandin. Di bingeha çerm de qatmanekî dohn heye. Ev **qatê bidohn** karbendiya parzûniyê dike. Li ser vê qatmanê, qatê nermî heye ku teva ji proteînan pêk hatiye. Ew qatmanê li ser qatmanê dohnî bi navê **çermê jêrî** tê nasîn. Qatê li ser wî jî **çermê jorî** ye.

Her du hêlên çermê jorî bi hunandinek ku avê derbas nakin çê bûye. Ne ji hundiruwê laş, ber bi derve, ne ji derve ber bi hundiruwê avê derbas dike. Nerm xuya bike jî pirr saxlem e. Laş, hemberî tîrêjên rojê yê ultrvîyolev diparêze. Pirraniya şanikên wê mirî ne. Qismê nêzîkî xwînê ku bi çermê jorî re têkil e qata şanikên bi can e. Ev şanik bi veketina ji hevûdin zêde dibin. Şanikên nû yê kevin daf didin û ji çermê jêrî dûr dikin. Şanikên çermê jorî pehn dibin û xasleta xwe winda dikin. Lê, dibin maddayek hişk ku bi navê **keratîn** tê naskirin. Ev karatîn wan şanikên mirî li hev dicivîne û hunandineke ku avê bi derve de û ji derve jî, ber bi hundiruwê naberde pêk tîne. Bilî vê, rê li ber maddeyên bi zerer jî digire. Yanî zirhekî parastinê derdixe meydanê.

Çermê Jorî di nava hunandinek pirr tevlihev de ye. Ev tevlihevî jî sexlemî û hêziyê didiyê de. Her qat bi qatê din ve hişk girêdayî ye. Lê, qatman zerarê nagihînin qatê din. Çiqasî em nebînin û tê negihîjin jî qismek ji çermê me di encamek berdewamî de diweşe. Bo cî dagirtina çermê weşandî, şanikên dibinê çerm de bê rawestandî şanikên nû çê dikin. Ev şanikên nû jî dikevîne dewsa çermê weşandî de. Di binê çermê jorî de şanikek heye ku rengekî tarî ya **melanîn** e ku maddeya **pîgment** çê dike.

Çermê mirov di rengên curbucur de ye û ji spî heya bi reştarî heye. Lê, pirraniya mirovan esmer in. Maddeya ku reng dide çerm **melanîn** e. Melanîn di çermê jorî de tê depo kirin û çerm hemberî rojê diparêze. Rengê mirovên di bin rojê de dirawestî, lewra reş dibe. Hejmara şanikên ku melanîn çê dikin di mirovên reş de jî, sor, spî û esmer de jî, weke hevûdin in. Bes di nava laşê mirovan de ya ku ferq dike hejmara melanîn e. Di çermê mirovan de karbendiya daxwaziya zêdekirina melanîn heye. Dema çerm zêde dibin rojê de bimîne dişewite û hew dikarê karbendiya çêkirina melanîn bike. Çêkirina melanîn jî demek dirêj digire. Ev jî dibe sedema nexweşiya zelîtanê, yanî kanserê di çerm de. Bandora tavikê li çêkirina wîtamîna (D) heye ku hestiyên mirov bi hêz dikê ye.

Çermê jorî mîna zirhekî xwe li dora laş pêça ye. Ku em li tixubê dinavbera çermê jorî û çermê jêrî dinêrin, hunandinek mîna çiyarêzan û newalan derdikevê hemberî me. Ew xwarûpêçkên dijwar girêdana her du qatan pêk tîne û na hêlin qatman ji ser hevûdin bişemitin. Çermê jêrî ji çermê jorî qalintir e. Di nava çermê jêrî de: Rayên xwînê û Rîşalk, Kîsikên Bezî yê Mûwan, Masulke, Tarîşkên têhnîk û hingivandinê û hêrsê... Tarîşkn hêrsî yê di çerm de, mîna pace û kûlekan tîkiliyê bi cîhana derve re dikin.

Fonksiyonek çerm ya din jî, ew e ku germahiya laş di pîvanekê de diragire. Mirov di çermê de xwehdan dide û xwîn dinava çerm li hev digihe hev. Ev mekanîzma dibe sedema hînkayiya aş. Çermê jêrî bi tarîşk û rîşalkên hurik pêçayî ye. Laş, xwîna di çerm de kontrol dike. Dema germahiya laş zêde bû, rayên xwînê fereh dibin û xwîna çerm bi zêdeyî di vana wan re dibûre. Ev jî dibe sedam ku çermê derbîkeve derveyî laş. Ev fonksiyona rayên xwînê ku çermê zerkî derî laş dikin dişibihîne radyatorê.

Mekanîzmeyek din ya ku laş hînik dike xwehdan e. Çermê mirov mîna moxilkê qulqulkî ye. Ev çavikên di çermê laş de heya bi kîsikên ezî yê xwehdanê ku di nava çermê jêrî de ne, dirêj dibin. Bez, ava ku ji xwînê distînin di van çavikan re derbas dikin û zerkî derveyî laş dikin. Ku şilahi dibe buhar dora xwe hînik dike.

Çerm di hewa sermayî de jî, bi germahiyê laş diparêze.

Kîsikên xwehdanê karbendiya xwe dirawestînin, rayên xwînê teng dibin. Dema ku serma dide laş û mûwên laş ziç dibin, ji sedema masulkeyên dibinê mûwan de ku tîne guvaştin çêdibe. Heger ev pêkhatin bo parastina mirovan, ji sermayê pêşve jî, ji lawiran re ku çermê wan bi mu û pirç e, xweş pêk tê. Minak: Kuçik qet xwehdanê nadin. Ji ber ku çermê wan ne qulqulkî ye û tîr pirç e. her çiqasî neyê dîtin jî, laş mirov jî bi mûwan pêçayî ye. **Por:** mirovan ji tavikê diparçêze... **Birh:** birka li ber xwehdanê ye ku nahêle bikevê çavên mirov de. **Mijgul:** Perdeya ber çavan e, ku nahêle madeyên bizerer ji der ve bikevine çavan de. Bilî van, tu karbendiya mûwên din di laşê mirov de nîne. Mû parçeyek ji çerm e. Hunandinek wê jî pirr tevlihev heye. Mû ji madeya **keratîn** çêdibin. Mû, ji kuraya wî bezê dibinê çerm de bi cî bûyî dertên. Mûwên nû, yê kevin daf didin û dibine sedema dirêjbûna mûwan. Kîsikê bezan yê mûwan xwedî demjiyanên teybet in. Ji ber vê çendê mû, demeke dirêj dibe û kîsikê bezî dikevê nav rawestandinekê de. Hingî dibinî de kokek bilif çê dike. Rawestandîna vî kîsikê bezî heya bi 90 rojî dikîşîne. Piştî dest bi çêkirina mû dike. Balkêş e ku tixubê dirêjbûna porê tune ye. Kîsikên bezî dohn çê dikin û zerkî derve dikin. Ev jî pora mirov bi dohn dikin. Kîsikên bezî, di dema xortaniyê de bi zêdeyî kar dikin û dibine sedama idap û pîrîkên di çerm de. Sêdema çêbûna pîrîkên ji karbendiya **gewrmorîkên** ku parastina laş dikin e. **Neynûk** jî ji xasletalaşê mirov tê. Neynûk jî mîna mû û porê ji madeya **keratîn** çê dibin. Bilî kîsikên bezî yê bi fêde ku xwedî fonksiyonên curbucur in, kîsikên bezî yê bêfêde jî hene. Karbendiya wan jî belakirina bêhna laş e. Pirraniya wan jî vê têhnîka xwe di kortika bin çengan re diberdine derve. Balkêş e ku ev avşolk derdikevê ser rûwê çerm bêhn tîde tune ye. Bêhn, piştî ku ew avşolk tevî bakteriyên ser çerm dibe derdikeve. Ev bêhn ji bo lawiran bo naskirin û dema tîkiliyên nêrûmêkî bi kêr tê. Heçî mirov in her xwestiyê vê bêhnê ji xwe dûr bixe.

ÇAV= Çav, ezayek ji laşê mirov e ku ronahiyê dirawergire û dişîne navenda mêjî, qonaxa dîtin û çavdariyê. Ronahiya ku ji serdoran tê berhev kirin, pêşî dikeve hêlîn, yanî **kortika çav** de û li wê qata hişk û berraq ku bi navê **kornear** tê naskirin. Kornear qata çav ya şahîk û berraq e. Ji derve ve jî niv gurover e. Dişibihe mercekê. Ew tîrêjên ronahiyê ku tevlihev û tewandî tîn ku di mercekê re derbas dibin dişikihîn û dîmen serneqotî di nokteyekê de tê ser hevûdin. Qata jor ya kornear ku nivtewan dî ye, tîrêjên ronahiyê dişikîne û di nava çav de berhev dike. Qatek din ku spî û şahîk e û li oda pişt wê ye û tarî ye, dibe alîkar ku ew tîrêjên ronahiyê hê bêhtirîn bêne şikandin. Şikandina wan tîrêjên alîkar ronahiyê dikevîne ser zarek **pîgmentî**, yanî **perdeya tenik** ku navê wê **îrîs** e. Çav rengê xwe, ji kêmbûn, yan jî zêdebûna pîgmentiyên di îrîs de yanî di **reşka çav** de distîne. Di nivê îrîs de yanî di nivê reşika çav de **bîbîk** heye ku ronahiyê derbasî hundir dike. Di ronahiya hindik û bi reng ku dikevê çav de masulkeya reşika çav dişikîhe û bîbîk mezin dibe. Bi mezinbûna bîbîk re pirr ronahî dikevê hundir de. Bi ketina ronahiyê re, masulkeyek din dilive û di cih de bîbîkê teng dike. Hingî jî ketina ronahiyê û hundirê kêmbûnê dibe. Wisa jî bîbîk, li gorî gelek bûn û hindikbûna ronahiyê xwe amade dike. Tîrêjên şikestî yê ronahiyê ku di bîbîka çav re dibûrin, diçîne navenda çav. Hunandina çav di encamek ku dikare ronahiyê di rengê dîmen de bide xuyakirin de ye. Ew parçeyên ku mîna mercekê ye navê xwe ji rengê xwe stendiye. Her du hêlên wê bi derve de tewandî ne. Spî, şahî û bê reng e. Tenik elastîkî ye û di hundiruwê kapsulekê de ye. Ev kapsu bi rîşalkan, bi masulkeyên mîna mijgulan ve, yanî **rêşîkan** ve girêdayî ye. Ku **rêşîkên** mijgulî tîne şidandin, giraniya li ser rîşalkan sivik dibe. Hingî ew merceka elsatîkî bi derve ve hê bêhtir tê tewandin. Beramberî vê, ku giraniya li ser rîşalkan kêmbûnê, ew tewandinan bi hêla derve ve hindik dibe, ev tengbûn û ferehbûn bi arbendîya kornea ve girêdayî ye. Em dizanin ku fonksiyona kornea ew e ku ronahiyê bişikîne û liser nokteyekê rawestîne. Lê ku tîrêja ronahiyê nêzikî çav dibe, dîmen dikevê encamek din de. Hingî mercekek din ku di çav de ye dikevê karbendiyê de û şikandina ronahiyê bi hêztir dike û dîmen safî dike. Yanî ronahî çkasî zêde bê şikandin, dîmen hewqasî bêhtir safî dibe û tê dîtin. Merceka di çav de vê fonksiyonê pêk tîne. Şikandina ronahiyê zerkî ser **qata tewaşî**, yanî **tora çav** dike û li ser nokteyekê dirûnîne. Ku ronahî ji hember ve bê, yanî direkt were, di nava rîşalkên hatî şikandin û merceka tenikbûyî re dibûre û bi tujayî li deverêkê dirûne. Lê ku ronahî ji objeyek nêzik bê, mercek fereh dibe û bi hêja derve ve tê tewandin. Dîmen jî li ser qata tewaşî, yanî tora çav ku binavê **retîna** tê binav kirin dirawestîne.

Retîna, yanî **tora çav**, ji teref doktoran jî bi haletê **oftaymaskop** tê kontrol kirin.

Hêla tarî ya çav, her dem cihê ronahiyê bêhtirîn diragirê ye. Di nivê wê hêlê de **kortela poveya** heye ku tujayî û dijawariya dîtinê tê de pêk tê. Parçeyê dawî ku weke hêtekî ye û qatek tewaşî li dora wê pêçayî ye heye. Ew qata tewaşî, ji pirr qatmanan û tevlihevîyek pirr seyr hatiye hunandin.

Navê wê **reha bînahiyê** ye. Di van qatmanan de bi milyonan şanik hene. Ronahî di qatmanên derve dibûre û diçe qatmanên dawî... Şanikên ku hemberî ronahiyê şiyar in 2 cure ne. Cureyê ku hemberî ronahiya kêmbûnê û bi reng, mîna **darika** ne. Rast in, direjik in... Cureyê ku hemberî ronahiyê dijwar jî, şanikên kubîk in. Bi hatina ronahiyê re **şanikên darikî** yê dirêjîk û **şanikên kubîkî**, bi ava kîmyewî dikevîne livandinê de. Bi livandina wan şanikan re **rîşalk** û **rêşîkên dîtinê** dikevîne leptê de.

Ev livandin û lept diçe nava **şanikên serî çuqlî**. Ev şanikên serî çuqlî, bes ji lept û livandina şanikên qata bi tewaşî ya tora çavan dikevîne karbendiyê de. Di ronahiya dijwar û zêde de, şanikên konîk kar dikin. Her yekî ji wan ku bi şanikên serî çuqlî ve girêdayî ne, wan **têxine leptê** de. Ji ber vê çendê jî, di ronahiya dijwar de karê şanikên kubîkî, di ronahiya kêmbûnê de karê şanikên darikî heye.

Lept û livandina şanikên serî çuqlî, şanikên hêrsê **têxine leptê** de.

Şanikên dîtinê ku bi van şanikan ve girêdayî ne tevlihev dibin, li hevûdin pêçayî û li dawîya çav pêçanek qalîn derdixine holê û dirêjî nava mêjî dibin û bi **rapirsên dîtinê** ve tîne girêdan.

Ra û rapirsên dîtinê yê her du çavan ku dirêjî serê mitîkê mêjî dibin, li cihê dîtinê ku çepastî, yan jî cihê ku bi navê **dîyazma** tê naskirin nêzikî hevûdin dibin.

Rîşalk li vê zomê bi çiqilî û şax dibin û nivî jî wan xwe diberdine hêla din ya navenda dîtinê.

Nivê din jî bi wan rîşalkên ku ji çav tîne re dibine yek û diçîne hêla din ya mêjî, navenda dîtinê.

Bi vî karî, ew rawergirtina her du çavan dibe dîmenek bi tenê û der tê holê. Her çav dîtinek û nêrînek cuda dirawergire. Ji ber ku rîşalk û reşîk û rapirsên dîtinê di reng in. Ji her du hêlan û her du çavan lept û livandina dîtinê pêk tê. Mêjî jî her du rawergirtinan tîxe yek dîmen û derdixine hemberî me. Wilo jî, kûrayî û navberê bêtir derdixine holê. Dîmen derxistina holê û anîna hemberî mirov, karbendîya biçûk û serîkên rîşalk û reşîk û rapirsên dîtinê ne, ku li zoma **koteksî** dilebitin û dilivin pêk tê.

Tiştê herî balkêş di çavan de ew e ku famkirina dîmen ku di qata tewaşî de ya tora çav de hatiye rûniştin, zu fêhr dibe, li wê gorê jî ezayên hunandina çavan dikevîne lept û livandinê de.

Lê tîgihîştin û famkirina mêjî bê rawergirtinê, çawa pêk tîne û wê reaksiyonan ava kîmyewî çawa tevger dike, hê xweş û qenc nehatiye fam kirin.

Ji bo gihîştina gelekî sê tişt pêwîst in; xwendegêh, xwendegêh, dîsa xwendegêh! Tolstoy

ZÊW Û PÎROZBAHIYA ZÊWAN

Semsedin ASLAN

Me, di nivîsandina xwe ya pêşî de dabaşa ŞÊHR û pîrozbahîya Şêhran anîbû zîman. Îro jî dixwazim ku li ser ZÊW û pîrozbahîya van rojên pîroz û rola wan di nava civaka Kurdî de rawestim. Her çiqaşî ev tola civakî di van salên dawî de di nava komên Kurd yê misilman de hatibe pêkanîn û hate nîşandan ya misilmanan e, ne rast e.

Ev tola gelê Kurd bi giştî tê pîroz kirin û ew kes û gorîstanên lê dicivin jî kes nizanê ê kîjan ol û baweriyê ne. Zêwa Cudî, Haxê Bêsa, Xalbûbê... Yan jî, Zêwa Kerben, Zêwa Şêx Hesên, Zêwa Seyîl Bilal, Zêwa Pîkûreş...

Demsala Havînî destpêka zêwan e... Lê di nava zêwên hêla Torê de a herî mezin Zêwa Seyîl Bilal bû. Ev zêw li gundê Bêcirman û di nava gorîstanê de dihate pîroz kirin. Sedema pîroz kirina di nava gorîstanê de Quba Seyîl Bilal bû.

Li gorî ragihandinên heremî Seyîl Bilal, piştî bûyera Kerbelayê, bi pis û pismamên xwe ve hatiye gundê Bêcirman ava kiriye û bingehê seyîl bûnê li vir daniye. Tê gotin ku seyîl teva ji vî gundê derketine. Piştî mirina Seyîl Bilal ku li gorîstana gundê te veşartin qubek li ser tê ava kirin û gorîstan jî bi navê wî bi nav bûye.

Di nava komên xelkê de jî ev gorîstan, helbet bi pêwana qubê pîroz hatiye qebûl kirin û xelk jî zarokên xwe dibe ber gorîstanê û dikine koçekê Seyîl Bilal. Zêw, her sal 15 Tebaxê çê dibe. Pirranî kesên ku zarokên xwe kirine koçek û kesên ku têne zêwê jî sewal digurînin. Gundiyên Bêcirman bêhtir ji her kesî sewal û dewar digurandin. Lê, dive bê zanîn ku ji her herema Kurdistanê kes dihatin vê zêwê. Ji Serhedê heya bi nava Botan kesan qîsta Zêwa Seyîl Bilal dikir. Helbet ev li hev civîn tevgerê mezin dida û di hêla dîrokî de jî cih distand.

Ku em li demedor û cîranên Kurdistanê dinêrin tu kirin û pîrozîyên wilo nayên dîtin. Lewra jî em li ser van rojên pîroz di encama dîrokî de dirawestin. Helbet di wê rojê de xelkê cil û kincên herî paqij li xwe dikirin her kesî jî dengbêj û hunermendên xwe yê herema xwe bi xwe re dianî. Her çar aliyê gorîstanê dibûne govendên duvdirêjî hevûdin. Keç û xort, û navser û kal milên hevûdin di girtin û direqîşin.

Vê dawiyê dahol û zirne hate qedexê kirin, lê kemeçê hebû.

Govendên dihatin lidarxistin, bi hejmar 30 çê dibûn. Roja destpêkê ji êvarî heya sibehî govend ne dirawestiya. Tewirandina Şalûl û Bilbilan, fiqêna Teyran, bêhnefişka zarokan, lîlêlîla jinan û dilojarêya kalejînan di nava vê tevger û hunandina civakî de cihê xwe digirt. Ew der cihê hev dîtina keç û xortan bû. Ev roja salê carekê dibû sedema dîtina kesên ji hêr hêla Kurdistanê.

Xasletek din ya vê zêwê ew bû ku her sê danê rojê xwarin goşt, tirşîka bi goşt û savar bû. Tiştê balkêş: dewleta Tirk her tiştê elaqetê wê bi kurdan re heye qedexê kirine. Sê rengên kurdan ku li ba kurdan pîrr bi kar tê kesk, sor, zer... Kesên ku ev reng di kinc û cilên wan de xuya bike tewanbar dikir û digirt. Îro jî, ev tol bi carekê qedexê kiriye.

WEŞANDINA PIRTÛKÊN KURDÎ
LI SOWYETÎSTANA BERÊ**Wezîrê EŞO**

Pirtûkên pêşî, yê Kurdî ku li Ermenîstanê û bi giştî li Sowyetîstana berê hatin weşandin, yê dersa, hînkirina zarokan û mirovên temenê wan mezin yê nexwendî bûn. Di destpêkê de, salên 30 î heya van salên dawî, di nava komarên Sowyetîstana berê de, Ermenîstan bû navenda weşandina pirtûkên Kurdî û bi giştî çanda Kurdî ya herî mezin. Piştî weşandina du pirtûkên darsê sala 1929 an livê komarê usa jî dest bi weşandina pirtûkên lîteratura (edebiyata) bedewî bû. Sala 1930 an beşa nivîskarên Kurd hate damezrandinê. Li ser esasiya nivîskarên li Ermenîstanê...

Çend rewşenbîrên Kurd bûne endamê wê. Ev gav bû bingeh û mecala pêşdebirina lîteratûra Kurdan ya bedewiyetê. Bo weşandina pirtûkên Kurdî yê edebiyatê weşana dewletê ya Ermenîstanêde, beşa pirtûkên Kurdî vekirin. Lê bilî yê darsan û politîkî, pirtûkên wergerandî hatin weşandin. Weşandina pirtûkên darsan û wergerandî bi destê eynî beş dihat miyaserkirin. Lê, ji bona weşandina pirtûkên politîkî, di nava weşanên partiyê de beşa pirtûkên Kurdî hate amade kirin. Berpirsiyarê her du seksiyonan, redaktorê pirtûkên Kurdî yê bersivdar ronekbîrê Kurd, Casimê Celîl hate kifş kirin. Casimê Celîl, sala 1930 an de eforeke pîrr mezin xerc kir, ji bo weşandina pirtûkên Kurdî. Wî, ev kar bi êgînî, bi ruhdarbûn û bêwestan pêk anî. Roja xwe teva ji weşanxanê der ne diket, ji ber ku wê hênê weşandina pirtûkên Kurdî karekî dijar bû. Weke tê zanîn, destpêka her karî dijar e... Em, berî her tiştî, di derheqa weşandina pirtûkên lîteraturî yê di salên 1930 an de biaxivin. Pirtûka pêşî ya lîteraturî ku li Ermenîstanê hate weşandin ya LAZO bû, (Hakop Xazariyan) bi sernivîsa 'SERHATÎYA CASÎM'... Ew sala 1931 hate weşandin. Sala 1932 an berevoka afirandina nivîskarên Kurdan yê pêşîn li Êrîvanê (payîtexta Ermenîstanê) hate weşandin. Bi sernivîsa 'EFRANDÎNA EWLÎN'... Di vê beravokê de helbest û kurteçîrokên van şair û nivîskarên Kurd hatibûn weşandin: Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Etarê Şero, lê wisa jî çend kesên din yê ku piştê dev ji vî karê afirandinê berdand... Di eynî salê de pirtûka Heciyê Cindî ya şano: 'QUTÎYA DU DERMANA' hate weşandin. Sala 1934 an beravoka afirandinê nivîskarên Kurd ya duduwan li Êrîvanê hate weşandin.

Di vê pirtûkê de ev nivîskar cih girtibûn: Cerdoyê Gêncî, Emînê Evdal, Heciyê Cindî, Ahmedê Mirazî, Etarê Şero û çend kesên din. Lê, 'Afirandina Sisyan' sala 1935 an de ronahî dît. Di vê berevokê de em, afirandinên Erebb Şamîlov, Emînê Evdal, Cerdoyê Gêncî, Heciyê Cindî, Casimê Celîl, Ahmedê Mirazî, Wezîrê Nadîrî, Etarê Şero û yê mayîn dixwînin. Dîsa wê salê bi pirtûkên cuda, şanoya Ahmedê Mirazî bi sernivîsa 'ZEMANÊ ÇUY', şanoya Wezîrê Nadîrî bi sernivîsa 'REVA JÎNÊ', kurte romana Erebb Şamîlov (Erebb Şemo) bi sernivîsa 'ŞIVANÊ KURMANCA', berevoka helbestên Etarê Şero, bi sernivîsa 'BÎRSANDÎNA EWLÎN', pirtûka helbestên Wezîrê Nadîrî 'NÛBAR' hatin weşandin. Di nava çanda Kurdî de xasma jiyana Lîteraturî de qewimandîneke berbiçav weşandina pirtûka folklorî (zargotina) Kurdan ya pêşî bû li Ermenîstanê.

Sala 1936 an, ev berevoka zargotinan bi sernivîsa 'FOLKLORA KURMANCA' hate weşandin. Ev pirtûka bi tîpê latînî, 664 rûpel bû. Berevokê nimûna folklorê: Emînê Evdal û Heciyê Cindî bûn... Lê, redaktorê bersivdar Casimê Celîl bû. Di wê pirtûka giranbiha de bawer bikin nimuneya hemûrengên folklorî Kurdî hatibûn civandinê. Beyt, serpehatî (epos), poyem, kilamên bangîtiyê, kilamên govendê, kilamên zarokan, çîrok... Tiştêkî balkêş bû weşandina 12 kilam (stranên Kurdî) bona şagirtên dibistanan. Ev stran sazbandzanê Ermenî Samson Çarparîyan civandibûn. Sala 1933 an 'XEBERNAMEYA ERMENI / KURMANCI' hate weşandin. Ew bi destê Wardan Pêtoyan, Emînê Evdal, Heciyê Cindî, Cerdoyê Gêncî hatibû amade kirin. Rast e ew ferhenga pêşî bû. Lê, beşa wê dewlemend bû... Wê jî roleke mezin lîst di nava pêşdebirîna û dewlemendkirina zîmanê Kurdî yê lîteraturî de û bû alîkarê wergervaniyê.

(berdewam dike)

PAULO FREIRE, PEDAGOGÊ BINDESTAN JI BRAZÎL

Derwêş M. FERHO

Bi vê nivîsara xwe emê di nav rûpelên *agahdarî* de babeteke nuh, lê balkêş, ji xwendevanan re pêşkêş bikin. Hêvî ew e ku di pêşerojê de her babeta ji bo gelê me nuh û girîng bê nasandin û em hin tiştên ji bo me baş wek mînak bistînin. Ez di vê baweriyê de me ku babeta me ya vê hejmarê, pedagogê Brazîlî Paulo FREIRE, merivekî gelekî balkêş e ku bê nasîn. Pedagog ji kesê mamoste, dersdar, hînkar, perwerdekar re tê gotin. Eslê vê gotinê Latînî ye.

Paulo FREIRE, di sala 1921 de bû ye. Dersdarê Dîrok û Fîlozofîya Pedagojîyê di Zanîngeha (Universîteya) Recife li Brazîl bû. Paş îngîlaba 1964 li Brazîl ew hate girtin û xistin girtîgehê. Çend meh paş girtina wî ew mecbûr kirin ku ji welêt bireve. Ew çû Şîlî. Li wira jî xebata xwe ya hînkirinê berdewam kir. Xebata wî bi teybetî perwerde kirina mezinan bû. Ew endamê Şewra Cîhanî ya Kilîse li Cenewre ye.

Awayê (*metoda*) P. Freire ji rastiya dîroka Brazîl peyde bû. Metoda wî kombîstasyoneke di navbera hînbûna alfabe û fêhira (xwe)nasînê ye. Di salên '40 de ji sedema nezanîna xwendin û nivîsandinê (analfabetîzm) li Brazîl 40 % ji gel xwedî dengdan û ra bû. 60 % din nikarîbû ne dengê xwe bilind bikin û ne jî raya xwe bidin. Sedem, analfabetîzm e. Kesê nikare binivîse û nikare bixwîne nikare mafê dengdanê bi kar bîne. Ne jî dikarin ji bo karekî bêne bijartin. Ew mafê wan nîne. Di navbera salên '50 û '60 de têkoşîneke bi navê "*Hêza Perwerde Kirina Gel*" peyda bû. Komela "*Hêza Çandî ya Gel*" gelek civîn û têkoşîn li ser babetên polîtîk, çandî, pozîsyona gel ya belengaz ku tê de ye, amade bûn.

Di salên 1963 û 1964 de Paulo Freire teorî û pratîka xwe bi hevra dike jiyane. Ew gelek xortan, xwendekaran, karkeran mîna koordînatoren ku ewê vê xebatê hilgirin ser milê xwe dighîne. Şeş hezar koordînatoren di van her du salan de kursên perwerde kirinê stendin. Ew her şeş hezar koordînatoren paş xwendina xwe li nav hemî Brazîl li nav "*Komikên çandî*" belav kirin ku ew nivîsandin û xwendinê hînî gel bikin. Armanca wî ew bû ku, li gora metoda xwe, di demeke kin de bi saya bîst hezar "*komikên çandî*" ku hebûn xwe bighîne du milyon analfabetên li Brazîl. Kursên hîn kirina xwendin û nivîsandinê ewê sê mehan dewam kiribane.

Tam di vê demê de jî gelek sendîkeyên cotkaran û karkeran hatin damezrandin. Ev jî ji bo vê projeyê bû palîkek baş. Paulo Freire ne bes tenê dixwest bi milyonan kesên analfabet hînî nivîsandin û xwendinê bike. Wî dixwest di demeke pirr kurt de wan milyonên ku heta nûka hatine perçiqandin û bê mafê bingehî ne weha perwerde bike ku ew ji pêşerojê re ji bo demokrasîyê amade bike. Metoda wî ew bû ku gel bi vê yekê hişyar bibe. Rastiya welêt fahm bike. Dîroka xwe ya kevn û nuh hîn bibe, sedemên feqîrî û paş mayînê hîn bibe û xwe xwe li ser jiyana xwe, li ser jiyana civaka ew tê de û rewşa siyasî û aborî analîz bike.

Çand di metoda Freire de roleke gelekî girîng distîne. Wî baş fahm kiribû ku li ser gel "çanda bédengiyê" hikim dike. Ew çand ji derveyê dinya wan li ser wan hatiye ferz kirin. Gel jiyana xwe bi çavên karbidestan didît: belengazî, nezanî, bédengî û qedere tev ji bo wan peyde bû ye. Diviya ew jiyana xerîb ji ser wan hunda bibe. Ango perwerde bûn û pêşde çûn pêwîst e.

Ezê azad û serfiraz bibim eger ez hînî nivîsandin û xwendinê bibim. Bi hînbûna nivîsandin û xwendinê ezê jiyana xwe baştir nas bikim. Di her hal û karî de ezê gava pêşin ber bi azadiyê biavêjim. Azadî bi têkoşînê tê stendin. Ji min re pêşkêş nabe. Metoda hînkirina Freire ji sê beşan pêk tê:

1. Di destpêkê de gotinên ji jiyana xwendekar têne nivîsandin û hîn kirin. Dersdar gotin û axaftinên xwendekar bi kar tînin dinivîse û tekrar dikin. Amanc ew e ku dersdar bizane koma xwendevan çiqasî zimanxurt e. Di vê demê de rewşa wan jî tê axaftin û munaqêşe kirin. Bi vê yekê: bîr kirin (fikir kirin), bi kar anîna ziman, pirsên bingehîn yê koma xwendekaran ronak dibe.
2. Di vê dema navber de (xwe)nasîn bi riya hînbûna nivîsandin û xwendinê dest pê dike. Li wê gorê jî gotin û munaqêşe têne bijartin û hîn kirin. Bi van gotin û axaftinên bijartî munaqêşeyên kûrtir li ser rewşa kes, malbat, navçe û welat.
3. Di dema dawî de xwendevan di warê bîrkirinê de (fikir kirin) perwerde dibin. Giranî li ser hîn kirina (xwe)nasîna giştî ye. Çanda gel, aboriya gel, jiyana siyasî ya welat û navneteweyî bi awayekî sivik têne munaqêşe kirin. Û ji her munaqêşê babetên cihê der dikevin meydanê. Bi vî awayê meriv hînî liberxwedanê dibe.

Eger em bixwazin bi kurtî metoda Freire binasin: perwerde kirina gel li ser bingehê çanda wî gelî bi xwe ye, armanca hîn kirina nivîsandin û xwendinê (xwe)nasîn e, li gora rewşa gel e, bibe bingeh ji bo dengê gel, perwerde kirina (xwe)nasîna siyasî ya krîtîk, ferqa serdestî û bindestiyê bide rakirin, dîtina rastiye di jiyana gel de, çanda bédengiyê vergerîne çanda berxwedanê.

Weke tê dîtin, Paulo Freire sistême nuh û serfiraz ji bo gelê xwe, gelê belengaz yê Barzîl amade kiriye. Paş reva wî ber bi Şîlî de wî xebata xwe li wira jî, bi alîkariya serokê Şîlî yê wê demê Allende, domandiye.

Gelo meriv stratejiya Paulo Freire li Kurdistan bifikire şaş e yan rast e? Dema stratejiyek kurtedemî ya perwerde kirinê di nav gelê Kurd de, bi **zimanê kurdî**, bi **axaftina kurdî**, li ser **bingeha çanda navçê ya kurdî**, li **li ser dîroka kurdî** û hwd. bê amade kirin dibe analfabetîzma nav kurdan pirr kêmtir bibe. Ji ber ku "axîn", "lorî", "hayê hayê", "li minê", "jarê" û bi hezaran mînakên din ji kurdî meriv ne dikare wergerîne zimanekî din û ne jî di wan ziman û çandên din tiştên weha hene. Ew nayê wê gotinê ku çanda me û zimanê me ji ya gelên din bi qedrtir in. Lê çanda me û zimanê me ji çandên din û zimanên din jî ne kêmtirtir e. Û li ser bingehê çanda xwe divê em perwerde kirina gelê xwe jî amade bikin.

agahdarî

Weşana

Enstituya Kurdî

Ya Brukselê

Berpirsîyar: Medenî FERHO

Redaksiyon: Kerîm BAQISTANÎ

Wezîrê EŞO - Ejder MEHEMED

Navnîşan:

Bonneelsstraat, 16

1210 Bruksel - Belgium

Nivîskar

berpirsîyarên

nivîsên xwe ne

Tel. 00 32 (0)2 230 89 30, 230 34 02, Fax 00 32 (0)2 231 00 97